Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1328 26-Mijdar-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Pêşangeha hunerên destan li Gundê Jinwar serxwebûna jinan diyar dike

Hêvî Keleş/Jinwar

**Pêşangeha hunerên destan li gundê Jinwar cihekî bêhempa ye ku şiyana jinan a veguherandina hunerên destan ji bo çavkaniyek hêz û afirîneriyê nîşan dide. Xebatên kolektîf, jinan tîne cem hev ku serxwebûna jinan diyar dikin û mîrateyek zindî û nasnameyek hevgirtî nîşan didin.**



Jinwar gundekî serbixwe yê jinan li Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê ye, wekî cihekî ewle ku jin bikaribin bi hev re bijîn, dûrî tundî û serdestiyê hatiye avakirin û xwe dispêre pergaleke hevkariyê ya li ser bingeha hevgirtin û çalakiya hevbeş. Li gundê jinan Jinwar, ku cihekî aram e û wekî modelek ji bo civatek serbixwe û bi rêberiya jinan di sala 2018"an de hatiye damezrandin, ji dema vekirina gund ve pêşangehek daîmî heye, ku hunerên destan ên ku ji hêla jinên ku bi dilxwazî li wir dijîn ve hatine çêkirin nîşan dide. Li dilê gund, ev pêşangeh wekî beşek yekgirtî ya projeya civakî û çandî radiweste û ji bo jinan platformek domdar ji bo hilberîn, pêşandan û têkiliyê bi hev re peyda dike.

Ev pêşangeh ne çalakiyek demkî ye, lê cihekî daîmî ye di nav Jinwarê de, ku jin berhemên xwe di seranserê salê de nîşan didin. Refên darîn ên sade berhemên ku ahenga di navbera xwezayê û jêhatîbûna destên jinan de nîşan didin, dihewînin û ev berhem beşek ji aboriya gund pêk tînin, ku xwe dispêre xebata kolektîf, hunerên destan ên ku mîrat û xweseriyê nîşan didin.

Pêşangeh cûrbecûr berheman pêşkêş dike, di nav de:

Qutiyên hirî yên bi destan hatine çêkirin, Peykerên seramîk, amûrên bi morîk û xemlên kevneşopî, nakişên Kurdî.

Ev hunerên destan ne tenê berhemên firotanê ne, lê belê dîrokeke hevpar di navbera jinên gund de û bîranîneke kolektîf a ku ji hêla destên ku biryar dane jiyaneke nû li cihekî li ser bingeha hevkariyê û rêzgirtina dualî biafirînin, temsîl dikin.

### Aboriyeke femînîst a domdar

Gund modela aboriyek temsîl dike. Jinên Jinwarê bi rêkûpêk bi rêya atolyeyên perwerdehiyê yên navxweyî jêhatiyên xwe pêş dixin û pêşangehên xwe li gorî demsalan û materyalên berdest nûve dikin. Ev xebata berdewam pêşangehê kiriye çavkaniyek aborî ya domdar ku alîkariya jinan dike ku serxwebûna darayî bi dest bixin. Yek ji jinên ku li pêşangehê dixebitin dibêje: "Em ne tenê berheman nîşan didin, lê di heman demê de çîroka xwe ya xweseriyê jî nîşan didin. Her perçeyek li vir wateyek ji jiyana me hildigire."

### Pencereyek li ser jiyana rojane ya Jinwar

Pêşangeh wekî xalek hevdîtinê di navbera mêvanên gund û niştecihên wê de kar dike. Gelek mêvan tên Jinwarê da ku li ser şêwaza jiyana kevneşopî ya jinan fêr bibin û pêşangeh bi gelemperî rawestgeha wan a yekem e, li wir ew dibînin ka jin çawa xwarin, kelûpelên malê û xemilandinên xwe çêdikin û tenê dema ku bi tevahî pêwîst be xwe dispêrin bazarên derveyî.

### Yekkirina mîratê û parastina bîra gelêrî

Bi rêya vê pêşangehê, jinên Jinwarê dixwazin mîrateya Kurdî yên ku windabûnê biparêzin. Neqişandina kevneşopî, seramîk û teknîkên honandina kevnar li vir ne tenê wekî hunereke kevneşopî, lê wekî piştrastkirina berdewamiya çandê tevî zehmetiyan jî têne pratîkkirin.

### Têkiliya civakî û peyameke mirovî

Pêşangeh ji rêxistinên civaka sivîl ên femînîst û çandî yên ku bi rêkûpêk serdana gund dikin, piştgiriyek exlaqî werdigire. Hebûna wê ya berdewam peyamek dişîne ku jin dema ku cihek ewle û rêkûpêk peyda bibe, dikarin avahiyên aborî û civakî yên serketî biafirînin. Wekî din, pêşangeh, bi sadebûn û berdewamiya xwe, felsefeya Jinwar a xweserî, parvekirin û hevgirtina femînîst ronî dike.

### Pêşangehek ku bi mezinbûna gund re pêş dikeve

Bi demê re, pêşangeh berfireh bû û berhemên nû û rûniştinên belgekirina mîratê jî di nav xwe de girt. Her ku Jinwar wekî civatek jinan a serbixwe mezin dibe, pêşangeh rola xwe wekî platformek ku her tiştê ku jinên wê afirandine û her tiştê ku ew xeyal dikin ku ava bikin nîşan dide, didomîne.

Bi kamîreya Ayşa Silêman



# SİWARO

Were siwaro
Siwarê xwena me
Destên qermiçî
li ser keviya bijangên me
dileyîzin
Kokên kevnar dixefêrin
Rondikan diparzinînin
Awiran berî hevdidin
Li bin siha refên ewanan
Li ber dengên wawîkan
Li ser textên serdema jinebî
Kabûsên ku li bin balîfên me
de
Hêlîna qêrinan çêkiribûn
Heya li me dibû sibeh
Tirsê xwe ji gerdena me re
dikir rist
Ta ku xwîdan dibû lihêf
Ma kî dikaribû raze
Tetika jiyana bê roxset
Mofirkên pişta me xûz dikir
Li nav qelîşekên xurifî de
Pariyên necûtî
Xwe di şikefta tariyê de
meisandine
Ew şevên xilexavî
Xwe li ber dilên me nagirin

De were siwaro
Em ketine bezbêrka dîtina te
Helkehilka keziyên hûnandî
Ji seqema tarîgiran de
Xwe di lîlavên agir de
şehdikin
Bi bêhnek çikayî
Xwe li xewna te dipêçin
Ji bilî dîtina te tu xwenên dî
Di çavên me de nazeliqin
Bêyî te
Raperînên nalînan xwe li hev
dixin
Dilên ku bi destên hev
girtine
Li kolanan de ber bi te ve
dihelin
Evînên netebitî
Ji awirên çavên te re
Meydanan dixwînin
Di çolistanên aramiyê de
Vedigevizin
Ta ku em siwarê xwe
Li ser hespa dilê xwekin
Û birevînin
Erê siwaro
Siwarê xewna me

## FERHENGA BIWÊJAN

**Bêşîr e, şîrê wî nîne:**
Bênanûxwê ye; qenciyê zû ji bîr dike; dostên xwe zû ji bîr dike.
**Çala wî dikole:**
- Pê re ne durist e.
**Çavzexel e:**
- Ne durist e; ne rast e; xayîn e; zikê wî bihîle ye.
**Çavzexeliyan dike:**
- Bi heman wateyê.
**Çavê te bigire/li ber çavê te bigire:**
- Tu qenciyê nabînî; tu ji qenciyê fêm nakî.
(Dema mirovek qenciyekê bi yekî dike lê nayê dîtin, çawa ku qencî pê nehatibe kirin, bêje te tiştek ji min re nekiriye hingê xwediyê qenciyê vê biwêjê bi kar tîne)
**Dilê me bi hev re rast e:**
- Dema du kes dixwazin hev bibînin lê bê civan hev dibînin, hingê tê gotin.
**Gora wî dikole:**
- Pê re ne durist e.
**Kûçik li ber siha darê mexel hatibû, digot siha teriya min e:**
- Bênanûxwê ye; li ser keda yên din dijî; rastiyê nabîne.
**Li ber çavê wî nayê:**
- Nabîne; qenciyê nas nake; bênanûxwê ye.
**Min xelk hîn kirin lîstikê (yan jî govendê), dû re (yan jî êdî) ti kesî destê min negirt:**
**- Min qencî ker xirabî li min vegeriya.**
**Rûvî li ber siha darê veketibû, digot siha dêliya min e:**
- Bênanûxwê ye; li ser keda yên din dijî; rastiyê nabîne.
**Siwar dibe Xwedê ji bîr dike, peya dibe hesp ji bîr dike:**
- Bênanûxwê ye; qenciyê ji bîr dike; bêwefa ye.
**Tiştek nayê ber çavê wî:**
- Bênanûxwê ye; qenciyê zû ji bîr dike.
Tu destê xwe ji devê wî derxî wê bi xencerê li te bixe.
**- Bênanûxwê ye:**
Xwe di qula derziyê re derbas dike:
- Ne durist e; dikare xweş mirovan bixapîne û ji kar bireve.
**Zexel e:**
- Ne durist e; ne rast e; xayîn e; zikê wî bihîle ye.

**LI SER LEWAZBÛNA HÊZÊ**

**Dar dikeve her kes bivirê xwe lê diceribîne:**
- Dema kesekî xurt kêm dikeve, her kes pê dikare.
**Ga dikeve kêr pir dibin:**
- Dema yek xizan dibe, yan jî dema bêbandor dibe yên biavêjinê, yên li dijî wî biaxivin pir dibin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 27'ê Mijdarê Cejna Berxwedana Neteweyî




Avabûna PKK'ê ji bo gelê Kurd û Kurdistanê vejînek bû, PKK'ê bi têkoşîna xwe ya 47 salan destanên dîrokî nivîsandin, li hemberî tarîtiya hêzên kapîtalîzm û zihniyeta sermayedaran bû çirûska azadiyê.**R-4**

## Di Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser jinan de cureyên tundiyan di pergalê de

Ger di sedsala 21'emîn de jin rûbirûyên tundiyê ne ku tenê di sala 2025'an de zêdeyî 840 milyon jin rastî şideta fîzîkî, cinsî û dîjîtal hatine, wê demê hebûna Rêxistinên Parastina Mafên Mirovan li ku derê rol dilîze?**R-2**





## Şehîd Dozdar Hemo ji ciwanên azadîxwaz re bû nimûneya azadiyê

Têkoşerê Kurd Dozdar Hemo di nava 30 salî de ji bo azadiya Kurd û Kurdistanê têkoşîneke bê hempa da meşandin, ew hem fermandarekî zîrek û pêşeng bû, hem jî hostayekî zîrek ê ramanê bû.**R-5**



## 'Komîn bingeha avakirina civakê ye'

Hevseroka Mecilsa Bajarê Qamişlo Hêvî Ehmed diyar kir ku komîn civakeke rast û pêşketî ava dike, di hemû zagonên cîhanê de cihê ku kombûn lê heye parastin, hevtemamkirin, çareserkirina pirsgirêkan û jiyana komînal û hevbeş heye.**R-6**

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar:1328 26-Mijdar-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# ÇÛYÎNA ÎMRALIYÊ GAVEKE GIRÎNG E LÊ NE TÊRKER E

Serokwekîla Koma DEM Partiyê û endama Komîsyona Demokrasî Xwişk-Biratî û Hevgirtina Netewî Gulistan Kiliç Koçyîgît diyar kir ku çûyîna komîsyonê ji Îmraliyê re bi qasî damezrandina wê dîrokî ye, ji ber Rêber Apo di çareserkirina pirsgirêkan de muxatabê sereke ye. Gulîstan da xuyakirin ku ne gengaz bû bêyî guhdarkirina Rêber Apo komîsyon karê xwe temam bike, lê tenê carek çûyîna Îmraliyê ne têrker e.**R-3**



## 'Sînemagerî bi qasî ku xebatekî hunerî ye, çalakiyekî şoreşgerî ye'

Sînemager Diyar Heso da zanîn ku li gor şert û mercên heyî rola sînemagerên Kurd girîng e û got, "Qutbûyînek heye, divê em nêz hev bibin û ava bikin, em bi hev re derfetên heyî bi kar bînin da ku berhem û lihavhatinek xweş û watedar derkeve holê."**R-7**





`Nena min, ji min re dibêje terbiyesiz`
Nehîr pale R-2



Bakur-Rojhilatê Sûriyê li ser mîrasa PKK'ê zindî ye!
Dilyar Cizîrî R-4



Qonaxa duyem; Civaka Demokratîk
Farûk Sakik R-5



Civaka bê parastin, civaka bi mirinê re peyman daniye
Ehmed Hesen R-6



Dubarebûn û rotîn naveroka çalakiyên çandî pûç dike
Kemal Necim R-7

# Di Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser jinan de cureyên tundiyan di pergalê de

**Ger di sedsala 21'emîn de jin rûbirûyên tundiyê ne ku tenê di sala 2025'an de zêdeyî 840 milyon jin rastî şideta fîzîkî, cinsî û dîjîtal hatine, wê demê hebûna Rêxistinên Parastina Mafên Mirovan li ku derê rol dilîze? Di vê raporê de em ê cureyên tundiyê yên di pergal û civakê de ku jin rû bi rûyê wan e bînin ziman.**

**Esma Mistefa**

1-Tundiya cesedî/fîzîkî

Tundûtûjiya fizîkî li dijî jinan yek ji pirsgirêkên civakî yên herî girîng li Rojhilata Navîn û li seranserê cîhanê ye. Bi hezaran jin hîn jî rojane rastî cûrbecûr cureyên şideta fîzîkî tên, hem di nav malbatê de û hem jî li derveyî malbatê. Tevî hewldanên yasayî û civakî, ev diyarde bi awayên cûda, pir caran dûrî çavên medyayê, berdewam dike.

Rêxistinên mafên mirovan radigihînin ku şideta fîzîkî pir caran bi reftarên hêsan û besît ên wekî pêlkirin û lêdanê dest pê dike. Lê belê ew dikare bibe sedema lêdaneke giran, bikaranîna tiştên tûj, an jî gefên bi çekan.

Pispor piştrast dikin ku sedemên tundûtûjiyê ji xizanî, stresa psîkolojîk û tiryakê tê. Her wiha ji ber kevneşopyên civakî yê ku zihniyeta mêr a serwer di nava civakê de, dibe sedema bikaranîna van tundûtujiyan li ser jin û di hundir malbatê de. di heman demê de girêdanbûyîna jin bi aboriya mêr û malbatê dibe sedem ku ev jin bêdeng bimînin û daxwaza parastin û mafê xwe nekin.



Lêkolînên dawî nîşan didin ku bandorên şideta fîzîkî ne tenê bi birîndarîyên fîzîkî ve sînordar in, lê di heman demê de digihîje nexweşiyên cidî yên psîkolojîk ên wekî depresyon, fikar û nexweşiya stresê yên piştî bûyerê. Ji bilî bandora wê li ser malbat û zarokên ku van kiryaran di hundurê malê de dibînin.

Tevî derxistina qanûnên ji bo parastina jinan li hejmarek welatan, pispor piştrast dikin ku bicîhanîna van qanûnan hîn jî rastî astengiyên têkildarî hişmendiya civakî û mekanîzmayên lawaz ên ragihandin û piştgiriyê tê.

2-Tundiya pîskolojîk û hestiyarî

Armanca vê tundiyê hilweşandina kesayeta jin e û li ser wê kontrolkirine ku di nava xwe de van dihewîne: Heqaret û destdirêjiya devkî, Gef, Kêmkirina ji qîmeta jin, Tecrîdkirin ji malbat û hevalan, Kontrolkirina tevger û hestan, Belavkirina tirs û zexta berdewam.

Her çend hin cureyên şideta fîzîkî ya li dijî jinan di salên dawî de kêm bûne jî, şideta pîskolojîk an hestyarî şêweya herî berbelav û veşartî ya şidetê bi giranî tê pêkanîn. Raportên rêxistinên herêmî û navneteweyî nîşan didin ku ev cure tundûtûjî li jinên bi temen û çînên civakî yên cuda dike tên meşandin. Yanî ne tenê faktoreke temen yan tebeqeyekê digre dest. Bi gelemperî hemû jin rastî wê tên.

Xeteriya wê di bêdengiyê de ye

Pispor tekez dikin ku xetera wê di bêdengiya wê de ye; ew nîşanên fîzîkî yên eşkere li du xwe nahêle, lê birînên kûr ên psîkolojîk dihêle ku başkirin û jê rizgarkirina wan dijwar be.

Tundiya pîskolojîk heqaretên dubarekirî, biçûkxistina jinan, gefxwarin, hewldanên kontrolkirina hûrguliyên jiyana wan, Her wiha tecrîda civakî û lîstina bi hest û hîsan vedihewîne. Ev rêbaz gelek caran wekî amûrên serdestiyê di nav malbatê an têkiliya romantîk de têne bikar anîn, jinê dixin nav çerxek tirs û windakirina baweriya bi xwe.

Lêkolînên pîskolojîk nîşan didin ku jinên ku rastî van binpêkirinan tên, ji fikar, depresyon û nexweşiyên xewê dikişînin, û dibe ku hêza biryardayînê an jî jiyana serbixwe jî winda bikin. Pirî caran ji ber tirsa ji civakê bêdengiyê diparêzin.

3- Tundiya Zayendî/Cinsî

Ev cure tundî ji xetertirîn cureyên tundiyê û şidetê li ser jin e ku him bandorê li ser fîzîk û him jî derûnî û pîskeolojîk dike. Di nava xwe de van dihewîne. Tecawîz, Tacîz, Îstsmara cinsî, Mecbûrkirina pêkanîna cins ku bê daxwaza jinê ye, Tecawîzkirina di zewacê de.

Tundûtûjiya cinsî yek ji binpêkirinên herî giran e ku jin di civakên cûrbecûr de pê re rû bi rû dimînine. ji ber ew di navber êrişa laşî, îstismara psîkolojîk û binpêkirina eşkere ya rûmeta mirovan dihewîne. Tevî hesasiyeta mijarê, raporên mafên mirovan piştrast dikin ku hejmara dozên qeydkirî rastiya rastîn nîşan nade, ji ber ku gelek qurbanî ji tirsa şermezarkirina civakî an kûştinê xwe ji ragihandinê dûr dixin.

Cureyên şîdeta cinsî ji tacîz û êrişê bigire heya îstismara li ser bingeha hêz an gefan diguhere. Pir caran ji hêla kesên dewlemend ve, têkiliyên nêz yên weke hezkirin û hwd de tên dîtin. Li gelek dewletan ev yek di cihên kar, dibistan, dewletên xizanitiyê jiyan dikin de pêk tê. Jîngeh û cografiya ku tê de serwextbûna civakî, pişgiriya jin, kampanyayên li hember van kiryaran û hesbkirina sûcdaran tê de nîn be, ew welat herî zêde tê de jin rastî van binpêkirinan tên.

4-Tundiya Aborî

Ev yek tê de bêparkirina jinan ji çavkaniyên wan ên darayî an jî kontrolkirina û xwedîderketina li wan tê. Rêxistinên mafên mirovan destnîşan dikin ku salane bi hezaran jin rastî kiryarên aborî yên destdirêjî tên, ji rêgirtina li ser xebata jinan bigire heya kontrolkirina mûçeyên wan û heta bêparkirina wan ji mîrat an milkê wan.

Lêkolînên mafên mirovan piştrast dikin ku ev cure tundûtûjî serxwebûna jinan lawaz dike û rasterast bandorê li ser şiyan û hêza wan a biryardana li ser jiyan û pêşeroja wê dike. Şîdeta aborî gelek caran beriya cureyên din ên şîdetê tê, jinan dixe rewşek girêdayîbûna darayî ku nahêle ew gavên ji bo parastina xwe an bidawîkirina têkiliyên destdirêjker biavêjin.

Her wiha rêjeyek mezin ji jinên dixebitin bi zextê re rû bi rû ne ku tevahiya mûçeyên xwe didin mêr an endamên malbata xwe.

5- Şideta Dîjîtal (Sîber/Elketronîk)

Ev cure şidet bi derketina tekneolojiyê re derket pêş. Di nav xwe de van dihewîne: Şantaja elketronîk, Gefên weşandina wêneyên taybet, Çavdêriya berdewam bi rêya cîhazan, Teşhîrkirina li ser internetê, Desthilatdarî û xewsandina elketronîk.

Bi belavbûna zêde ya medyaya civakî re, şîdeta elketronîk bûye yek ji awayên herî gelemperî yên şîdeta li dijî jinan. Ev tundûtûjî ku li pişt perdeya telefonan veşartî ye, bandorên psîkolojîk û civakî dihêle ku ji tundûtûjiya kevneşopî ne kêmtir cidî bin, bi hezaran jinan dike hedefa şantaj, tacîz û heqaretê.

Rêxistinên mafên dîjîtal radigihînin ku giliyên jinan ên derbarê şantaj û tacîza serhêl (hejmarî) li ser platformên dîjîtal de zêdebûnek girîng nîşan didin. Tawankar pir caran wêne an agahiyên kesane yên qurbaniyan bikar tînin da ku wan tehdît bikin an jî wan kontrol bikin.

Pisporên ewlehiya dîjîtal piştrast dikin ku tacîza serhêl di serê lîsteya binpêkirinan de ye, piştî wê jî şantaj, diziya nasnameyê û şopandina dîjîtal tên. Jinên ciwan ên ku li ser platformên medyaya civakî çalaktir in, herî zêde rastî van êrişan tên.

Di gelek rewşan de, ev êriş dibin sedema tecrîda civakî ya jinan an jî vekişîna wan ji înternetê ji ber tirsa tacîz an jî heqaretê. Her wiha ger bûyerên şantajê hatin belavkirin di gelek civakên girtî de dibe sedema kuştina jin yan zaroka keç her wiha ji bo jina karmend dibe sedema windakirina xebatê xwe.

6- Tundiya civakî yan çandî

Girêdayî adet û kevneşopiyan e wek: Zewaca bi zorê, Zewaca zû, Tercîha mêran, Astengkirina tevlîbûna civakî ya jinan, Sînordarkirina azadiya tevger, cil û bergan.

Ev cure tundûtûjî, ku pir caran li pişt dirûşmeyên "adet" û "kevneşopiyan" tê veşartin, sînordarkirinên neragihandî li ser jinan ferz dike û maf û derfetên wan di perwerde, kar û jiyana giştî de sînordar dike. Rêxistinên mafên mirovan destnîşan dikin ku şîdeta civakî û çandî li dijî jinan di nav malbatê de dest pê dike ku hişmendiya cudakariya zayendî ji zarokatiyê ve bi rêya tercîhkirina mêran û sînordarkirina keçan têne çandin.

Sînordarkirina azadiya tevger û cil û bergan her wiha înkarkirina mafê jinan ji bo biryarên xwe, di nav kiryarên herî berbiçav de ne ku jin di gelek civakan de pê diêşin.

Zewaca zarokan yek ji formên herî giran ên vê tundûtûjiyê ye, keçan ji perwerdeyê bêpar dihêle û wan di demek dirêj de dixe xetereyên tenduristî û psîkolojîk.

Lêkolînên civakî nîşan didin ku hin jin bi hincetên çandî mafên mîrat an mafên darayî ji wan tên bêparkirin, rûxmî hebûna qanûnên zelal ku van mafan ji jin re garantî dikin.

7- Tundiya yasayî yan jî sazîcîtiyê

Ev tundûtûjî ne ji kesekî ve tê kirin, lê ji avahiyek yasayî an saziyek fermî tê ku divê berpirsiyarê edalet û parastinê be, ev jî bandorên wê kûrtir û xeternaktir dike. Tundûtûjiya yasayî gelek şêweyan digire, bi taybetî qanûnên ku di warên wekî rewşa kesane, jinberdan, welayet, netewe (cinsiye) û mîrat de wekhevî li jin û mêran nakin. Li hin welatan, jin hîn jî nikarin neteweya xwe bidin zarokên xwe an jî bi hêsanî ji hevjîna xwe veqetin, lê mêr xwedî insiyatîf û maf in.

Her wiha Tundûtûjiya sazî xwe bi pratîkên rojane di nav saziyên ewlehî, dadwerî, tenduristî û perwerdehiyê de nîşan dide. Gilî û gazindên jinan li qereqolên polîsan dikarin bên paşguhkirin. Her wiha di giliyên dozên şîdeta navmalî de dibe ku bi salan bidomin, û ev yek dibe sedem ku gelek jin ji daxwaza mafên xwe paşve gav biavêjin.

Ev cure tundûtûjî ne tenê rê li ber jinan digire ku mafên xwe bi dest bixin, lê di heman demê de çandeke civakî jî xurt dike ku wan dixe rewşeke ku her tim xwe hîs bike di jêr de ye û di bin desthilatdariya mêr de ye.

8- Tundiya siyasî

Ev cure tundî li derdora durxistina jinan ji beşdarbûna siyasî tê zivirandin ku di van aliyan de pêk tê: Gef, Teşhîrkirin, tundûtûjiya di dema kampanyayên hilbijartê de, durxistina wê di cihgirtina di cihên biryarê û rayedartiyê de.

Her ku hebûna jinan di jiyana giştî de zêde dibe, tundûtûjiya siyasî wekî yek ji astengiyên herî mezin ku di dema hebûna xwe di cihên biryargirtinê de bigre, derdikeve holê. Ev tundûtûjî ku bi awayên rasterast û nerasterast pêk tê, tenê ji ber ku jin in hedef digire. Armanca wê rola jin qels bike û hebûna wan di qada siyasî de kêm bike. Tundûtûjiya siyasî li dijî jinan di gelek astan de xwe dide der, ji zextên civakî yên ku rê li ber wan digirin ku ji bo wezîfeyê an dengdanê bibin namzed, bigire heya kampanyayên reşkirinê, tacîz û gefên ku namzet û çalakvanên jin rastî wan tên.

Pisporên siyasî bawer dikin ku ev tundûtûjî ne tenê armanc dike ku jinan qels bike, lê belê armanc dike ku avahiyên desthilatdariyê yên kevneşopî yên ku li ser çalakiyên siyasî serdest in jî biparêze.

9-Tundiya li ser bingeha adet û kevneşopiyan

Mînakên wê ev in: zewaca zarokan, zewaca bi darê zorê, tiştên ku jê re "sûcên namûsê" tê gotin, sinetkirina jinan û sînordarkirina azadiya jinan bi navê adetan. Ya herî bi êş jî ku tu jinekê ji rastiya zayendîbûna wê bi rêya sinetkirinê mehrûm bike ye. Ev diyare li gelek welatan heya roja îro tê bikaranîn.

## Ji Pênûsa Jin

### `Nena min, ji min re dibêje terbiyesiz`

**Nehîr Pale**

Keçeke Kurd a 9 salî ye, gotina Pîrka wê:` Tu terbiyesizî` di mejiyê wê de ma ye. Dibe ku napirse çima Pîrka wê jê re dibêje:` Tu bê terbiye ye` lê di aqilê wê de dimîne. Ew hîs dike û di aqilê wê de hatiye rûniştandin her tevger bike dibe ku Pîrka wê dîsa bi acizbûn jê re bibêje:`Tu bê terbiye ye`.

Ez dixwazim ji hemû aliyan ve li bandora vê gotinê, li ser keçên biçûk binêr im. Destpêke ez dikarim vê gotinê parçeyek ji sîstema dewlet û civaka zayendperest bibîn im, ya dîtir jî ev gotin dûrî exlaq e û yek ji rêbazên desthilatdariyê ye.

Keç û jinên li gorî adet û zagonên malbatê û civaka zayendperest tevnegerin bê terbiye têne dîtin. Her kes fêr bûye ku çi ji jinê re bibêjin divê jin bêdeng bimîne û bersiva wan nede. Kîjan jin li gorî wan tevnegere û li wan guhdar neke wê bê exlaq û bê terbiye dibîn in. Terbiye, exlaq ji bo jinan mijarên ku çarenûsa wê diyar dikin û gelekî bandor li ser jinê dikin. Eger tu ji jinekê re bibêje tu bê terbiye ye, mîna tu wê bukjê, ew qasî neyînî bandor lê dike. Êdî ji xwe şerm dike û nema dikare li riwê kesekî binêr e.

Exlaq û terbiye li gorî pîvan û zagonên dewlet û dîn hatine diyar kirin, malbat jî li ser zarokên xwe ferz dikin. Jin ji temenekî biçûk tê fêrkirin ku li gorî pîvanên dewletê û dîn biçe. Ew pîvan û zagonên di bin navê terbiye û exlaq ji jinê re têne diyar kirin, dawiya wê koletî ye. Di encama exlaq û terbiya civakê de jineke azad dernakeve, jineke baskên wê şikestî, fedyok û zeyîf derdikev e.

Jina hewl dide ku bibe xwedî nêrîn û di hemû rewşên malbatî û xebatê de bibe xwedî helwest ji aliyê malbat û civaka zeyendperest ve bê terbiye tê nas kirin. Li ser van jinan şerekî taybet ê mezin tê meşandin, ne mumkine ku di hest û aqil de aram bijî. Ji ber ku hewl dide hebûna xwe diyar bike û bibe xwedî helwest her kes êrîşî wê dikin.

Keçeke 9 salî ji ber li malbata xwe guhdar nake jiyan li wê kirine jehr û wê ji mafên wê mehrûm dikin. Malbat şûna ku pêre bibe alîkar û fêr bibe hebûna xwe biparêz e êrîşî wê dikin ji ber li zagon û quralên wan guhdar nake. Her wiha jinên ku temenê wan hejdeh derbas bike ji ber li zagon û quralên malbatê guhdar nake tûndî lê tê kirin û ew şidet dibe ku bighîje asta ku ji aliyê bav, bira û hevjînê xwe ve were kuştin. Terbiya ku malbat behsê dike li gorî exlaqê dewletê ye û dikeve xizmeta dagirkeran de. Ya herî zêde dibe qurbanê vê yekê jin û ciwan in. Jin an wê serê xwe li ber zayendperestî û zagonên dewletê bitewîne û teslîmî mêr bibe yan jî wê were red kirin û bi tenê were hiştin.



# 'Sînemagerî bi qasî ku xebatekî hunerî ye, çalakiyekî şoreşgerî ye'

**Sînemager Diyar Heso da zanîn ku li gor şert û mercên heyî rola sînemagerên Kurd girîng e û got, "Qutbûyînek heye, divê em nêz hev bibin û ava bikin, em bi hev re derfetên heyî bi kar bînin da ku berhem û lihavhatinek xweş û watedar derkeve holê."**

**Zana Roj/Qamişlo**

Sîmemageriya Kurdî di çi astê de tê birêvebirin, li gor pêvajoyê û demê gelo dikarî biherike. Herwiha li Rojavayê Kurdistanê bi taybet xebat û pêşvebirineke çawa heye. Têkildarî van mijaran û bi taybet rêveçûna sînemageriya Kurdî Sînemager Diyar Heso bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wisa bû.



**Di Kurdistanê de sînemageriya Kurdî di asteke çawa de tê birêvebirin û hûn çawa lê dinêrin, gelo sînemageriya Kurdî di van çend salên dawiyê de karîbû li gorî ku tê xwestin xebat û berhemên xwe ava bikra?**

Asta sînemageriya Kurd û Kurdistanê li gorî asta ku gel û doza Kurd tê re derbas dibe mirov dikare binirxîne, herwiha li gorî neteweyên din yên cîhanê mirov dikare bigre dest. Ger em sînemageriya Kurdistanê bigrin ber sînemageriya cîhanê helbet bi qasî gelek welatan ne pêşketiye. Lê belê li gorî şert û mercên ku tê re derbas dibe, di asteke baş de ye. Çima em vê dibêjin; Ji ber ku beşek mezin ji welatê me di bin dagirkeriyê de ye, her wiha di bin êriş û zextên dagirkeriyê weke Bakurê û Rojavayê Kurdistanê de têkirin ku gelê me bi van kiryaran re rû bi rû ye. Şert û mercên şer di gelek aliyan de tê kirin, him li ser binesazî û aboriya herêmê her wiha di encama salên dirêj yên polîtîkeyên durxistin û paşguhkirinê tevî van hemûyan jî sînemageriyeke Kurdî heye. Zimanekî ku ji aliyê dewletên dagirker û mêtinger ve dihate tunekirin û qedexekirin, nasnameya Kurdî qebûl nedikirin, her wiha bi dînamîkên helandina hundirîn jî hewildanên tunekirina pişaftinê dikirin. Lê belê dema em van hemûyan tînin ber hevdu, hebûn, çand û sînemageriya Kurdî di asteke baş de tê birêvebirin.

Sînemaye Kurdî hê pir jê re divê, ji ber ne hêsan e tu di bin dagirkeriyê de be û tu sîneme çêke, ne hêsan e zimanê te qedexe be û di bin mêtîngeriyê de be, tu bi ziman û çanda xwe mezin nebe, stran û dengbêjiya te qedexe be, lê rûxmî wê jî tu sînemageriyê bikî û pêş bixî. Ne tiştekî hêsan e. Mînak; Li Sûriyê Rêjîma Baas sînema nehêştibû, yek ciwanekî Kurd nedikarî di beşa sînemayê de kar bike û bixwîne.

Lê di 5'emîn Festîvala Fîlman a Navnetewî ya Rojava de ku piştî 5 salan tê çêkirin, gelek berhemên hundir, ji çar perçeyên Kurdistanê û ji welatên cîhanê hatin. Her çiqas kêm bin lawaz bin jî, lê belê di astekê de xebatekî bi armanc û ked hat amadekirin û dengvedana xwe avakir. Lê belê em bêjin li gorî asta ku tê xwestin de ye, na. Ji ber di pêvajoya ku em wek netewe tê re derbas dibin de çawa ku Rêbertî pênase dike "Me hebûna xwe misoger kiriye, lê me hîn azadiya xwe bi dest nexistiye". Di pêvajoya bidestxistina azadiyê de,erka li ser hemû tevgerên çandî, bi tayebt sînema weke hunereke civakî, pir zêde ye. Niha li gor asta ku tê xwestin de ye, na. Ji ber hîn destekdayîn, kombûyîn û hevgirtin pêwîst e. Her wiha hevgirtin û alîkariya sînamegerên Kurd pêwîst e. Di heman demê de zêdekirina çalakiyên piştgiriyê bidin sînemegerên ciwan û di warê perwerdehiyê de. Ev hemû gav û erkên me ne ku em jî weke sînemagerekî Kurd li hember van berpirsyar in.

Gelek kesên pispor di sînemageriya Kurd de hene, bi taybet ji ber ku em li Rojava ne em dikarin bigrin dest. Hejmarek ji sînemagerên ku bi vê karî re mijûl dibin û di asteke pispor de didin xwendin hene. Bi taybe di peymangehên hunerî yên ku hatine vekirin de, sînemagerî bi awayekî pispor tê xwendin.




**Sînema yek ji qadên herî girîng yê ku dikare bandor bike û dengeyan biguherîne. Gelo di vê demê bi taybet de sînemager, derhêner û lîstikvanên Kurd çiqas karîn di nava pêvajo û guhartinên ku hatine rûdan de rol bilîze?**

Belê; Hunera sînema hunerekî komî û bi kolektîv tê çêkirin. Hejmarek mezin ji lîstikvanan, teknisyanan û karmendan digre nav xwe, heyanî ku berhem derdikeve. Ne weke hunerên din e. Ji ber wê hêza wê ya avakirin û guhertinê çi di aliyê hest de be, çi di aliyê raman û fikir de be, zêde ye. Sînema hunereke rastteqîne, tu mecbûr e nêzî rastiyê û heqîqetê bî bi rastî. Ji ber wê jê hêza xwe ya rastiyê vebêje û şîrove bike zêde ye. Di vê milî de bandora sînemayê li ser civakê dibe û dikare bike. Her wiha di avakirina kesayetê de, di guhertina rewşenbîriya civakê de bandoreke wê heye. Lê ger wm bêjin di aliyê ku dengeyên civakî û siyasî biguherê, divê tam cih negre, ji ber ev zêde bi aliyê siyasî û leşkerî ve girêdayî ye. Ger niha em li vir civiyane û em festîvalê lidar dixin, ve ji ber ku Tevger û Rêveberiya Xweser li Rojava rê vekir da ku em karê sînemayê bikin û ewqas kes ji derve de werin û tevlî vê xebatê bibin. Derveyî wê ji ber şert û mercên ku herêm tê re derbas dibe, tu alî rê nadin ku ev kes derbas bibin û xebatek bi vî awayî bê avakirin.

Di hundir van şert û mercan de helbet rola sînemayê mezin e. Ji bo wê jî divê sînemagerên Kurd û Kurdistanî bêhtir rola xwe bilîzin. Niha asta ku em pê kar dikin hinekî qels e û li pişt pêvajoyê ye. Di serdema heyî de guhertin û veguherînên pir mezin çêdibin, bi bêşengtiya Rêber Apo, hêzên Kurdî û Tevgeria Azadiyê tê kirin. Di asta cîhanê de di hundir van pêvajoyê de hemû dibistan û tevgerên hunerî yên mezin di şert û mercênm guhertin û şoreşgerî yên bi vî awayî de derketine. Ev rewş dihêle ku bi hezaran çîrok, berhem û fîlm bên derketin. Lê belê em weke sînemageriya Kurdî û Kurdistanî li gorî vê pêvajoya heyî em hinek li paş mane. Em di wê baweriyê de ne ku pêwîstî bi hewildan, insiyatîv û wêrektiyeke mezin heye da ku em jî wan erk û berpirsyartiyên xwe pêk bînin.

**Têkiliyên qada sînemayê bi derhêner, lîstikvan û sînemagerên cîhanê re çawa ye, her wiha tu xebatên we yên hevbeş bi hev re çêbûne?**

Bi kurtasî ez dikarim bêjim; Gelek têkiliyên me bi derhêner, sînemager, hunermend û kolektîvên hunerî yên cîhanê re çêdibin. Bi rastî ev têkilî û pêşketinên ku çêdibin jî di Rojava bi taybet de dîsa bi saya Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ye. Ji bo gelek hunermend, saziyên hunerî û sînemageran, balkêşe ku tu di nava rewşa şer de fîman çêbikî, behsa bûyerên wan şeran û trajediyan bikî, her wiha kesên ku di wan bûyeran de cih girtine tu bi wan re fîlm amade bikî, ev hemû ji bo wan balkêş tê. Û bi qasî ev xebat çalakiyekî hunerî ye, çalakiyekî şoreşgerî ye. Ji bo wê, ev xebat ji gelek derdorên şoreşgerî, demokrat û yên çepgir re balkêş tê. Têkiliyên baş û erênî hatine pêşxistin. Her wiha bi rêya van têkiliyan jî gelek berhem û xebatên hevbeş bi hev re hatine amadekirin, him wek berhem him jî çalakiyên hunerî ku beriya vê pêşengehên hunerî hatin nîşandan û tevlî festîvalên navnetewî bûne. Gelek berhem bi hev re hatine çêkirin yan bi derveyî welat re em bûne destek û alîkar, her wiha ew hatine vir û me bi hev re berhem amadekirine yan jî bi wan re bûne destek.

**Em bûn şahid ku Festîvala Fîlman a Navnetewî ya Rojava dengvedanek avakir. Bû cihê kombûna hêza sînemagerên Kurdistanê û cîhanê, bi wesîleya vê fesîvalê yekbûyîna di nava sînemegerên Kurdistanê de hûn çawa dinirxînin û di demên pêş de dikare çiqas bibe hêza hevgirtin û berhemdanê?**

Piştî derbasbûna pênc sala ku bi guhertinên siyasî, şert û mercên me beriya niha anîne ziman ve girêdayî ye, yek ji sedemên ku me xwest em festîvalê lidar bixin; Ew bû ku em van sînemagerên Kurd û Kurdistanê bînin gel hev. Dibe ku li welatên din sazî û dezgehên fermî hene ku van xebatan dikin, kom dikin û destek didin. Lê li Kurdistanê heyanî niha nîne, em jî dixwazin viya avabikin. Bi navê sazî, kombûn, komîn, kolektîv, mirov dikare di demên pêş de van nîqaş bike. Lê em dixwazin tiştekî wisa avabikin ku hemû sînemagerên kurd werin gel hev du û pêwîstiya me ji her kesî û her netewî zêdetir pê heye, her wiha xwesteka me ji her kesî bêhtir heye. Di dema festîvalê de gelek sînemager yên hatin û nehatin em bi wan re diaxivin ku hemû jî ji yekkirina vê hêzê re vekirî ne. Xwestek, hewcedarî û derfet heye, tenê dimîne em werin gel hev û em biratîk bikin.

Qutbûyînek heye. Divê em nêz hev bibin û ava bikin, kî li ku dibe bila bibe, di astekê de divê em hemû bighînin hev du. Em bi hev re derfetên heyî bikar bîbînin. Berhem û lihavhatinek xweş û watedar derkeve holê.

## Têbînî



### Dubarebûn û rotîn naveroka çalakiyên çandî pûç dike

**Kemal Necim**

Dema ku mirov der barê mijarkê de têbîniyekê arasteyî xwêneran dike, helbet mebesteke wê têbîniyê heye, mebesta sereke jî ew e ku eger kêm û kurtiyek hebe were dîtin û sererastkirin. Lewma carna eger rewşeke kêm û kurtî bi awayekî dubare bibe, mirov dikare careke din têbîniyên xwe bi awayekî din û cida dubare bike.

Mebesta vê pêşgitinê ew e ku me berê carekê di vê quncikê de behsa mijara girîngiya çalakiyên çandî û pêşxistina wan kiribû. Vê carê jî emê dîse behsa wê mijarê bikin. Çalakiyên çandî yek ji wan formên ku naveroka çandî ya civakê yan beşekî civakê diyar dike. Lewma lidarxistina çalakiyên çandî ne reftareke bê armanc û tenê ji bo şahînî û kêfê ye, lê belê çalakiya çandî bi armanca pêşxistina çand, perwerde û şahiyê di nav civakê de û ji bo dewlemendkirina jiyana çandî ya takekes û civakê bi giştî têne pêkanîn.

Di vê mehê de de hin çalakiyên çandî li ser asta kantona Cizîrê hatin lidarxistin. Yek ji wan 8`mîn Mihrîcana Osman Sebrî ya wêjeyî bû, ya din jî Duyemîn Festîvala Çandî/Beşa Çîrokê bû.

Bê guman her du çalakî jî bi nirx in û dibin egera liv û tevgereke rewşenbîrî li herêmê. Lê di naverok û bernameya çalakiyan de îsal ti guherîn ya afrêneriyeke berbiçav nebû, berovajî wê bi bernameyeke dubare û lawaz hatin lidarxistin. weke her sal bernameya çalakiyan bi semînerkê û panelekê û xwendina çend helbestan birêve çû. Ji bilî ku mijarên semîner û panelê dubare bûn, her wiha navên ku beşdar jî bûn dubare bûn, navên ku helbest ji xwendin dubare bû, ango kesên ku hatin û beşdar bûn li ber destê xwe mijarek nû û cuda nedîtin.

Di her du mihrîcanan de jî pêşbirka wêjeyî hebû, yek jê pêşbirka deqên şanoyê bû yek jî ya kurteçîrokê bû, lê ji ber bangeşî û ragihandina lawaz, hijmara kesên ku beşdarî pêşbirka deqên şanoyê pir kêm bû, vê yekê hişt ku hevrikiya di navbera beşdaraan kêm bû, her wiha komîteya nirxandina deqan hin berhemên lawaz xelat kir, ji ber ku derfeta bijartinê pir kêm bû.

Di mihricana Çanîdî ya beşa çîrokê de jî, kesên ku hatin beşdarî çalakiyê bûn dixwestin ku li çîrokan guhdar bikin, lê ji ber ku dema lidarxistina mihrîcanê pir kurt bû, derfet nehat dayin ku kesên beşdar bûne çîrokên xwe bixwînin.

Çalakiya çandî ya serkeftî ew e ku her salê ji ya berê baştir be, sûd ji şaşî, lawazî û kêmasiyan werbigire û sala din wan lawaziyan kêm bike. Her wiha divê li gorî navê xwe (Mihrican) xwedî bernameyeke afrêner û berferh be, mijarên nû, gotûbêjên nûjen û berhemên bi bandor pêşkêş bik. Eger wiha nebe wê naveroka çalakiyan her were dubarekirin û heman kes tim derkevin pêşberî xelkê û heman nêrîn û boçûnên xwe dubere bikin.

Komîteyên amadekar divê pêşî armanc û mebesta lidarxistina çalakiya xwe nas bikin, li gorî wan armanc û mebestan lêkolîn bibin, bernameyên afrêner bi mijar û babet û gotûbêjin nûjen, saz bikin da ku çalakî bihêje armanca ku ji bo wê hatiye lidarxistin.

# ‘Komîn bingeha avakirina civakê ye’

Hevseroka Mecilsa Bajarê Qamişlo Hêvî Ehmed diyar kir ku komîn civakeke rast û pêşketî ava dike, di hemû zagonên cîhanê de cihê ku kombûn lê heye parastin, hevtemamkirin, çareserkirina pirsgirêkan û jiyana komînal û hevbeş heye.

**Diyana Nidal\Qamişlo**

Ji despêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê pergala Xweseriya demokratîk li ser bingeha avakirina komînan civakê bi rêxistin kir. Komîn li gund, tax, bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine avakirin û erka wan a bingehîn bi rêxistinkirina civakê ye, ji ber bingeha netewa demokratîk, azadî, wekhevî û edalete. Komîn di taxa xwe de kar, xebat, barê civakê, xizmetguzarî, mazot, xaz, paqijî, alîkariya mirovan di aliyê madî û manewî de pêk tîne. Di heman demê de, gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi saya komînan parastina xwe ya rewa dike. Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê gel bi saya komînan dikare xwe bi xwe bi rê ve bibe û civaka xwe bi rêxistin bike.

**Danasîna komînê**

Komîn tê wateya komek kesên ku li tax û gundên xwe teşe didin jiyanê û hemû pirsgirêkên aborî, çandî, tendirustî, civakî, çandinî û ewlekariyê bi riya komîteyan çareser dikin. Komîn rêveberiyek biçûk ji rêveberiya xweser e, biçûktirîn



şaneya berpirsiyariyê ye. Di derbarê rol û girîngiya komînan di nava civakê de Hevseroka Mecilsa Bajarê Qamişlo Hêvî Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

**‘Her çiqas komîn aktîv be wê civak were aktîvkirin’**

Hêvî Ehmed anî ziman ku komîn mînaka civaka birêxistinkirî ye û wiha pê de çû: “Komîn di civakê de, civakeke rast û pêşketî ava dike. Di hemû zagonên cîhanê de cihê ku kombûn lê heye parastin, hev temamkirin, çareserkirina pirsgirêkan û jiyana komînal û hevbeş heye. Ji bo wê avakirina komînan di civakê de tişta herî girîng û sereke ye. Ji ber ku ew komîn dibe bersiv ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkan. Di civaka komînal de destên ji derve tunene, ji ber ku ew xwe bi xwe bi rê ve dibe û komîte hene ku xebatên xwe didin meşandin. Di her komînê de gelek komîte hene weke komîteya aborî, perwerde, çand, huner, tendurustî, parastina rewa û hwd. ji ber vê yekê komîn ji civakê re pir girîng in. Rêber Apo gelekî girîngiyê dide komînan. Gotineke Rêber Apo heye dibêje ‘Heger ez rojekê ji zindanê derkevim ez ê di komînek de cihê xwe bigrim’ ji bo wê jî em weke gel gelekî girîngiyê didin komînan û gere em li kar û xebatên komînan xwedî derkevin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê komîn bi roleke sereke radibin û kilîta çareseriyê ne di her kolan û taxê de. Komîn xwe naspêre tu ziman, ol û neteweyan ji bo wê jî gel xwe dispêre komînan ji ber ku komîn komîna gel e. Komîn bi hemû pêdiviyên gel ên weke perwerdekirin, avakirina sîstemê, rêxistina gel û peydakirina pêdiviyên gel radibe.”

**‘Komîn stûna civakê ye’**

Hêvî Ehmed da zanîn ku komîn stûna civakê ye û wiha got: “Ji ber ku komîn di civakê de tişta herî sereke ye, gelek projeyên me ji bo pêşxistina komînan hene. Projeyên me pêşxistina aboriya komînan, pêşxistina perwerdeyên ku di komînan de werin dayîn û avakirina meclisên taxan mala gel, hemû lêvegerîna sazî û dezgehên me di hundirê komînan de hene. Gere her komînek bi rol û misyona xwe baş rabe, heger komîn ne bi rêxistinkirî bin ew civak ne bi rêxistinkirî ye ji ber ku komîn dendika neteweya demokratîk e.”

**‘Rola jin di komînan de diyarker e’**

Hevseroka Mecilsa Bajarê Qamişlo Hêvî Ehmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Komîn ji 5 komîteyên bingehîn pêk tê ku her komîteyek a din temam dike û hevsengiyê ji bo birêk û pêkbûna xebatê ava dikin. Bi riya van komîteyan gel çareseriya ji tevahî waran de dibîne û berê xwe didin komînan. Taybetmendiyeke din a cuda heye ku komîn bi rêbaza hevseroktiyê tê birêvebirin, ev yek jî dihêle ku vîneke hevpar di rêvebirina kar û barên civakê de derkeve holê. Bi taybetî jî bo jinan jî komîteya jinan heye ku roleke çalak dilîze. Di warê mijûlbûna bi mijar û pirsigirêkên jinan de xwedî berpirsyarî ye.”

## Bîra Civakê



### Civaka bê parastin, civaka bi mirinê re peyman daniye

**Ehmed Hesen**

Di hundirê her elementekê, heyberekê û zindiyekî de şiyaneke xwezayî ya parastinê tê dîtin, di heman çarçoveyê de ji pirîmatan bigire heta şaneyên yekhucreyî, ji lawirên xişinde heya yên firinde, ji lawirên bejahî heya yên avî hemû jî di bin sîwana sîstemên cihêreng û li gorî şert û mercên xwe xwedî taybetiyeke xweparastinê ne, ne tenê ev, heta sîstema gerestêrka cîhanê jî bi riya qata Ozonê ya ku ji oksîjêna giran (o3) pêk tê xwedî sîstemeke parastina rûyê erdê ji tîrêjên Rojê yên bi ziyan e, weke van bi sedan mînakên şênber ên gerdûnî hene ku di cewherê xwe de xwedî diyardeya parastinê ne. Parastin tevgerek avakirina avahî û pirên di navbera mirov, xweza û hebûnê de ye. Her çend em pênaseyên klasîkî û teng birêsin ku parastin tenê di çarçoveya komeke mirovî li ber komeke dîtir xwe biparêze û bê armanc dijberiyan bike de bifikirin, ewqas jî em ê ji rastiya gerdûnî ya ku kakilê vê têgînê di nava xwe de dihewîne bibuhirin û bi qalibên rasyonalîzma modernîteya kapîtalîst ve bên kilîtkitin, di serê her rêbazeke parastinê de armanceke bingehîn a têkoşînê heye, parastina bê armanc vediguhere qada feodalîzmê û her ferdek dibe xwedî biryareke serbixwe, ev yek jî derî heya dawiyê li parçekirina û tesfiyekirina navxweyî vedike û dawî li sîstema xweparastinê tîne. Piştî 14 salên şerê navxweyî li Rojhilata Navîn, nexasim li Sûriye ya ku encam da ew bû ku, ji ber komên cîhadîst ên ku qaşo bi navê şoreşê çek hil dan, bê armanceke diyar û zelal şer kirin, di bin sîwan û fermandariya hêzên derve de vîn û biryardarîya xwe ji dest dan, ketin bin bandora xefika rêxistinên weke DAÎŞ, Nusra û hêzên li pişt wan û pergala xwe ya rêxistinî ji dest dan, serî li çetetî û terorîzekrinê dan, li vir mirov nikare behsa çi cûreyeke parastinê bike, ji ber a ku hat kirin ji parastinê wêdetir xirabkirin û tûndûtûjiya li dijî mirovbûnê ye. Mirov dikare parastina cewherî ya ku xwe dispêre sîstema civakî weke tovê bingehîn ên hemû pîvanên xweparastinê di roja îro de rast bibîne û bike modeleke serkeftî ya nûjen. Di dîrokê de jî komên civakî ji bo parastina xwe bikin xwe spartine parastina cewherî û weke mafekî rewa li dijî hemû cûre êrîşên ji derve ev rêbaz bingeh girtine. Di rastiya parastinê de ji zagon û mekezagonan bêhtir rêgez û pîvanên exlaqî yên komînal dikarin heq bikin, lê bi şertê ku xweparastina ku bê esasgirtin nebe amûreke dagirkeriyê û di bin sîwana ferdekî dewletparêz de neyê organîzekirin. Çekên ku niha di bin destê hêzên hegemondar de tên mezinkirin qaşo bi mebesta parastinê tên çêkirin dikarin hewirdora cîhanê zêdetirî deh caran tune bikin û bi erdê re bikin yek, ev çek ji bilî qirkirinê bi tu awayî çênabin bibin amûrên xweparastinê, berovajî wê amûrên tunekirina berhemên milyonan salan ên gelan e, tecrûbeya Hîroşîma û Nakazakî hîna di bîra dîrokê de zindî ye û diyar e ka ev dêwê bi navê bombeya atomî çi anî serê van her du bajaran, ji bilî wê çi çekên ku di bin navê parastinê de xweza, bajar û mirovan tune dikin amûrên herî xeternak ên dawîanîna li jiyanê ye. A rast çeka herî mezin a parastina rewa îradeya civakî û asta zanebûna civakan e. Çendîn parastin rêbazeke serkeftî ya berdewamkirina parastina nirxên civakî be, lê îradeya civakî ya ku rê li ber şerên qirkirina fîzîkî digire bêhtir dikare bibe xwedî roleke serkeftî ya parastinê.

# Yek ji kevintirîn xwaringeh li Qamişlo: El -Simûd

**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Xwaringeha El-Simûd ku li taxa Xerbî ya li bajarê Qamişlo ye, di sala 1978”an de hatiye vekirin. Wê demê ew tekan e xwaringeha li taxê bû û yek ji navdartirîn xwaringehên pispor di warê çêkirina xwarinên gelerî de dihat hesibandin.**

Beriya 40 salî li bajarê Qamişlo, li taxa Xerbî li ser kolana Amûdê, Xwaringeha El-Sumûd yek ji nîşaneyên herî berbiçav ên bajêr bû. Ew ji xwaringehek ku xwarin pêşkêş dikir bêtir bû, ew beşek ji bîra kolektîf a bajêr bû. Xwaringeha El-Sumûd di sala 1978”an de ji aliyê Hec Mûsa Ebdul Hemîd ve hatiye avakirin, Mûsa Ebdul Hemîd, di destpêkê de li ser erebeyeke gerok dixebitî ku humis, fûl û felafel difirot. Piştî pênc salan, wî Xwaringeha El Nejma li taxa Qidûrbek vekir. Çend sal şûnda, wî cihê xwaringeha niha ji xwediyê wê, Muhemed El Şamîa, kirî û wekî Xwaringeha El-Simûd bi nav kir. Mûsa di sala 2002”an jiyana xwe ji dest da. Wî projeya xwe bi xewneke biçûk û îradeyeke mezin dest pê kiriye, di demekê de ku Qamişlo bajarekî bêdeng bû, zû bû cihekî hevdîtinê ji bo karker, xelk û rêwiyan, herwiha bû cihekî ku çîrok û axaftinên rojane yên mirovan lê diciviyan. Bêhna felafel û xwarinin jê derdiket û kolanên taxê tijî dikir, ji ber vê yekê mirovan dizanîbûn ku “El Simûd” roja xwe wekî her car zû dest pê kiribû. Ew bi xwarinên xwe yên xweş û gelêrî tê naskirin.



**Xwaringeha El-Simûd nav û wateya xwe parast**

Mûsa Ebdul Hemîd di nav xelkê Qamişlo de bi hezkirina xwe ya ji bo paqijiyê û rêzgirtina xwe ya ji bo kesên ku dihatin xwaringeha wî dihat nasîn. Wî gelek caran digot, “Paqijî bingeh e û xwarina baş ne hewceyî reklamê ye.” Lê belê mîna karsaziyên din ên herêmê, xwaringeh jî bi rewşên dijwar re rû bi rû ma ji ber ku şert û mercên aborî û civakî yên bajar guherîn. Hejmara karmendan kêm bû û bihayên materyalên bingehîn zêde bûn, ku bandor li ser xebat û domdariya wê kir. Tevî vê yekê, xwaringeh bi salan berdewam kir, nav û wateya xwe parast, heta ku bû sembola xebata civakî li bajêr. Di sala 2023”an de, piştî zêdetirî 45 salan ji xizmetê, hate ragihandin ku xwaringeh wê were girtin, ji ber ku erdê ku lê bû hate firotin û wê bibe avahiyek niştecihî, lê belê piştî ku erd hate avakirin dîsa xwaringeha El-Simûd hate vekirin. Niha jî rêveberiya wê Ramî Ehmed e, herwiha xwediyê xwarngehê du birayên bi navê Idrîs û Xalid ku xwaringeh beriya wefata Hac Mûsa jê kirîn. Di xwarigehê de 22 karker hene û beşê jinan û zilaman cûdayî hevin, herwiha di dema niha de xwarinên ku ew çêdikin bêhtir bûne. Ew ji xwaringeheke gelêrî bêtir e, ew çîroka cihekî ye ku tevî guhertinan û dijwariyan jî li ber xwe daye.



# ‘Pêwîst e komîsyon ji aliyê qanûnî ve guhertinê bide çêkirin’

Serokwekîla Koma DEM Partiyê û endama komîsyonê Gulistan Kiliç Koçyîgît diyar kir ku biryara komîsyonê ya çûna Îmraliyê bi qasî damezrandina wê dîrokî ye, ji ber Rêber Apo di çareserkirina pirsgirêkan de muxatabê sereke ye û got, “Ne gengaz bû ku em bêyî guhdarkirina Rêber Apo karê komîsyonê temam bikin.”

**Ronahî Sadûn**

Derbarê kar û xebatên Komîsyona Demokrasî Xwişk-Biratî û Hevgirtina Netewî yên dema dawiyê, herwiha girîngiya çûna Komîsyonê cem Rêber Apo, Serokwekîla Koma DEM Partiyê û endama Komîsyonê Gulistan Kiliç Koçyîgît bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:





**-Wekî tê zanîn Komîsyona Demokrasî, Xwişk-Biratî û Hevgirtina Netewî ev demeke ku xebatên xwe didomand û xebatên xwe anî asta dawî. Heta niha di kijan astê de xebatên xwe da meşandin?**

Komîsyona Demokrasî, Xwişk-Biratî û Hevgirtina Netewî piştî lihevkirineke siyasî di 5’ê Tebaxa 2025’an de hat damezrandin. Ev komîsyon du armancên bingehîn hebûn. Ya yekem, civakîkirina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bû. Ya din jî nîqaşkirina zagonên taybet yên vê pêvajoyê ku em jê re dibêjin zagonên veguhêz û pêşkêşkirina wan ji bo pejirandinê ji raya giştî re bû. Di vê wateyê de, komîsyonê piştî 5’ê Tebaxê, guhdarkirinên berfireh lidar xist, van guhdarkirinan meşandina guhdarkirinên hemû beşdarên peywendîdar ji beşên cûda yên civakê nîşan da. Herwiha di vê çarçoveyê de gelek beş hatin komîsyonê, nerîn û ramanên xwe ragihandin. Li ser vê bingehê, xebata komîsyonê hêdî hêdî derbasî qonaxa raporkirinê bûye û niha nêzî xêlasbûnê ye.

**-Hûn bi xwe di komîsyona ku biçe Îmraliyê de cih digrin û biryara komîsyonê ya çûyîna Îmraliyê ji bo pêşketina pêvajoya aştiyê gaveke girîng e, hûn vê çawa dinirxînin?**

Biryara komîsyonê ya çûna Îmraliyê bi qasî damezrandina komîsyonê dîrokî ye. Ji ber vê yekê, em dixwazin hêviyên xwe ji bo biryarek ewqas girîng diyar bikin. Bê guman me dixwest ku gelek partiyên siyasî yên din dengê xwe bidin vê biryarê û ew bi lihevkirinek tam di parlementoyê de derbas bibe, lê mixabin li ser vê mijarê lihevkirineke ku li gorî tê xwestin çênebû. Niha em ê wekî 3 partiyên siyasî biçin Girava Îmraliyê û bi Rêber Apo re hevdîtin bikin. Ez dixwazim girîngiya hevdîtina bi Rêber Apo re ji bo çareseriyek demokratîk a pirsgirêka Kurd tekez bikim. Herwiha em tekez dikin bêyî ku Rêber Apo, komîsyon guh bide Rêber Apo, nerîn û ramanên wî berhev bike û pirsên ku ew meraq dike jê bipirse, derfeta ku ev pêvajo bi rastî pêşve biçe, kûr bibe û bi ser bikeve, pir kêm e. Me ev wekî pêwîstiyekê diyar kiriye. Li ser vê mijarê hin nîqaş hene, hin partiyên siyasî jî diyar kirine ku ew vê yekê wekî israr an jî weke derfeteke mezin dibînin. Em bawer dikin ku Rêber Apo di çareserkirina pirsgirêka Kurd de muxatebê sereke ye. Di heman demê de Rêber Apo mîmarê aştiyê ye. Ji vê wateyê ve, ji bo me ne gengaz bû ku em bêyî guhdarkirina Rêber Apo, karê komîsyonê temam bikin. Ji bo wê ez dixwazim careke din girîngiya dîrokî ya serdana komîsyonê ya Îmraliyê û hevdîtina rû bi rû ya bi Rêber Apo re tekez bikim.

**-Gelo hevdîtinên ku bên çêkirin wê çiqasî bandora xwe li ser siyaseta Tirkiyê hebe?**

Divê em tekez bikin ku ev civîn dê bandorên xwe yên girîng hebin. Em wekî komîteyek ku ji sê kesan pêk tê, dê biçin Îmraliyê û bi Rêber Apo re hevdîtinek bikin. Li ser vê bingehê me rêbazek pêşniyar kir ku dê piştrast bike ku qeydên civînê ji 51 endamên komîteya parlementoyê re werin xwendin, bi vî rengî piştrast dibe ku in. Me diyar kir ku ev ê bibandortir be. Herwiha pir girîng e ev civîn di rapora komîteyê de cih bigire û tê de were nîşandan. Ev ê ji bo pirsgirêka Kurd a bi rastî girîng, çareseriyek demokratîk û rêyek ev gaveke ku wê deriyê serdemek nû û veguheztina qonaxa duyemîn hîn bêtir veke. Rêber Apo serdema nû wekî qonaxa duyemîn bi nav kiribû, ango gavên siyasî û zagonî. Lewra pir girîng e ku ev civîn pêk hat û Rêber Apo pêşniyarên xwe, di nav de pêşveçûnên ku li ser bingehek siyasî û zagonî hewce ne, ji me re û bi rêya wî ji komîteyê re ragihand. Di vê wateyê de ez dibêjim ji bo destpêka serdema nû, gaveke awarte û dorhelekê girîng e.

**-Mijara di çûyîna komîsyonê ya li îmraliyê de ku wê CHP nûnerên xwe neşîne di raya giştî de bû cihên nerazîbûnê, hûn vî sekna CHP çawa dinirxînin?**

Bê guman, divê em bibêjin ku ne tevlîbûna CHP û partiyên din ên siyasî ji bo dengdana komîsyonê û bi taybetî jî nepejirandina wan a dengdanê, nayê qebûlkirin. Pirsgirêka Kurd ji bo her partiyek siyasî û her welatiyekî ku li vî welatî jiyan dike, pirsgirêkek e. Ev pirsgirêk ne tenê ji bo DEM Partî, AKP û MHP ye. Ew ji bo 86 milyon mirovên ku li vî welatî dijîn, pirsgirêkek e. Ji bo wê ji destpêkê ve me daxwaz kiriye ku partiya sereke ya muxalefetê xwe ji bo vê pirsgirêkê berpirsiyar bibîne û çareseriyek bi rastî demokratîk ji bo pirsgirêka Kurd a di aliyê mafnasîyê de, misoger bike. Lewra me gelek caran gotiye ku divê ew di komîsyonê de cih bigirin û heta di pêşengiya hemû pêvajoyê de biryardanê bikin. Lê mixabin di dawiyê de, di bin zexta derdorên nîjadperest de, wan helwestek neyînî li ser mijara çûna giravê girtin. Lê bê guman gelê Tirkiyê bi xwe dê vê yekê di çarçoveya pirsgirêka Kurd û peywendiyên xwe bi Kurdan re binirxîne. Di wê wateyê de, hêviya me ew e ku CHP dê bêtir beşdarî pêvajoyê bibe û piştgiriyê bide wê. Hem jî divê helwestek bigire ku ji AKP û MHP derbas bibe. Di heman demê de divê em tekez bikin ku helwesta ew li pişt xwe digirin, ne rast e. Dema ku em helwesta niha ya MHP’ê digirin ber çavan, ne wêrekiya CHP’ê di vê biryarê de bi rastî jî xemgîn e û têgihîştina wê dijwar e. Di dawiyê de, pirsgirêka Kurd yek jî berpirsiyariyên herî mayînde yên vê axê ye. Çareserkirina vê pirsgirêkê hewceyê wêrekî û berpirsiyariyê ye. Em van hemû hêviyan ji Parlementoya Tirkiyê jî raya giştî re diyar dikin û em hêvî dikin ku di siberojê de, hem di qonaxên rapor û hem jî yên zagonî de, ew dev ji vê helwestê berdin û di misogerkirina pêşketin, kûrbûn û encamdayîna pêvajoyê de helwestek berpirsiyartir bigirin, da ku çareseriyek demokratîk ji bo pirsgirêka Kurd misoger bikin.

**-Ji bo ku pêvajo bi encam bibe û pirsgirêka Kurd li ser bingeheke demokratîk bê çareserkirin, pêwîst e çi bê kirin? Herwiha ji bo serxistina pêvajoyê tenê hevdîtinek pêk bê ne diruste, lê divê mafê hêviyê yê Rêber Apo pêk were, lewra çi pêwîst e ku ev yek pêk were?**

Ev pêvajo xwedî gelek pêdivî û qonaxa ye. Yek ji wan pêdiviyan jî tendirûstî, ewlehî û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye. Her çiqas di mijara tecrîdê de pêşveçûnek hebe jî, lê serdan û hevdîtin ku tenê çêkirin li gor daxwaza me û ya Rêber Apo, pêk nehatiye. Heta ku rewşa Rêber Apo neye guhertin, em nikarin pêvajoyê bi awayek tendurist bigrin dest. Ji ber wê jî yên ku bixwaz in bi Rêber Apo re hevdîtin bikin û kesên ku Rêber Apo jî bixwaze bi wan re hevdîtin pêk bîne, çi akademîsyen, nivîskar, rewşenbîr û kesên sîyasetmedar bin, divê zemîneke diyalogê bi awayekî lêz were pêşxistin. Di heman demê de yek ji pêwîstiyên herî bingehîn ku ji destpêkê heta niha em tînin rojevê ku bilez û bez pêk were, mafê hêviyê ye. Tenê carek çûyîna komîsyonê ya Îmraliyê wê di şert û mercên Îmraliyê de tu guhertina nede çêkirin, lê pêwîst e helwestekî ku di şert û mercên Îmraliyê de guhertinan bide çêkirin, bê pêşxistin. Ji ber wê jî pêdivî pê heye ku mafê hêviyê bi awayek yasayî û hiqûqî bê naskirin. Ev hemû di pêvajoyên pêş de wek xebatek sereke li pêşberî me ye.

# 27'ê Mijdarê Cejna Berxwedana Neteweyî

Avabûna PKK'ê ji bo gelê Kurd û Kurdistanê vejînek bû, PKK'ê bi têkoşîna xwe ya 47 salan destanên dîrokî nivîsandin, li hemberî tarîtiya hêzên kapîtalîzm û zihniyeta sermayedaran bû çirûska azadiyê.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Piştî şerê cîhanê yê duymîn, hêzên desthilatdar ji bo berjewendiyên xwe gelê Kurd kirin qurban,li her çar perçeyên Kurdistanê bêdengî û xewek giran hebû. Herwiha gelê kurd bêhêviyek mezin jiyan dikirin. Tişta ku hatibû serê wan weke qedera xwe qebûl kiribûn. Li Bakurê Kurdistanê û Tirkiye jî bi giştî qeyrana aborî, siyasî û civakî dihat jiyankirin. Bi giştî Tirkiye û Bakurê Kurdistanê ber bi karîsekê ve diçû. Di hema demê de li cîhanê pêşketina şoreşê berfireh dibûn. Bi giştî dû blokan li hemberî hev sekinibûn. Ya yekem faşizim bû û gihiştî bû lûtkeya xwe. Ya duyem jî ji sosyalîzim weke hêviyekî ji bo mirovahiyê di sedsala 20'an de şoreşên mezin da pêşxistîn. Ev rewş bandora xwe li Tirkiyeyê jî kiribû.

### Ragehandina avabûna PKK'ê

Rêber Apo li ser van rewşane pir difikirî û jî zarokatiya xwe ve ku ji gund derdike ve nakokêyên di milê ziman, çand û bê bawerî jiyan dike. Di Newroza 1973'an de bi grubekî şeş kesî ku piranî xwendekar bûn. Li kêleka sedê çubuk ya Enqerê, bi gotina "Kurdistan bindest e" destpêdike. Biştre Rêber Apo dest bigera li Kurdistanê dike. Navçeyên weke: Dersim, Agirî, Bingol, Riha, Muş, Entap û Batman'ê serdan dike. Civinan çê dike û gelek kesayetan dibîn e. Di 1977'an li Entab'ê bi destê "sterka sor" Hakî Karer şehîd dikeve. Li ser bingeha bûyina bersiv ji vê şahadetê re, di 27'ê mijdara 1978'an de PKK 'ê tê ragihandin. Di vê pêvajoyê de gelek partiyên çepger ên Kurd û tirkên ku weke sosyalist xwe di dan naskirin jî cewhera xwe derketin, berê xwe dane Ewropa û bi wî şêwazî hatin bê bandorkirin.



Heta li hemberî PKK'ê ji hatin bi kar anîn. Lê PKK'ê weke yekane partiye ku xwe li ser lingan girt di saya Rêber Apo de, berê xwe da Filistin û ji Rojhilata Navîn derneketin. Ji Rojhilata Navîn dernektîn ji tê wateya dest ji ax û gelê xwe bernedane. Ev jî xwe dispêre zanabûna kurd a dirokî, ideolojî û felsefeya Rêber Apo. PKK 27'ê Mijdara 1978'an li gundê Fîsê yê girêdayî Liceya Amedê bi amadebûna 22 kesan hat avakirin. Di pêşengiya Rêber Apo de berxwedan û têkoşîneke mohra xwe li zêdetirî nîv sedsalê ya her kêliya wê watedar xistiye.

### PKK'ê li hemberî taritiya kaptalîzimê bû çiruska azadiyê

Bi vî şewazî her çû PKK'ê mezin bû û bû hêviya gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn. Dihat femkirin ku dijminê fasîşt tenê bi zimanê siyasî xwe li çareserkirina pirsgirêka Kurd nade, tû çarî nasname, îrade, bîr û baweriya gelê Kurd nas nekiriye. Ji bo wê yekê jî êdî biryara vegera welat û pêşxistina xebatên çekdarî çêbû. Ji ber zimanê dewlata Tirk a faşistî. PKK'ê heya giştê ve astê bedelên pir giranbiha dan e. Di zindanan de û bi taybetî jî di zindana Amed de, bi pêşengatiya Şehîd Mazlum Doxan û Kemal Pîr berxwedaniyek bêhempa hat meşandin. Ew berxwedanî li hemû qadan piratîk bû û di nav gel de belav bû. Bi têkoşîna PKK'ê, gelê Kurd astengiyê pir mezin derbaskirin û bi nasnama xwe ya Exlaqî û polîtik di cîhanê de bû pêşeng. Mînak ber çavan jî paradigmaya Rêber Apo ye ku li ser bingeha netewa demokratîk, ekolojîk û azadiya cinsî bûye minakek ji Rojhilata Navîn û tevahî Cîhanê re. Herwiha di rêya Rêber Apo û PKK'ê de gelê Kurd heya astekê gihiştîne azadiya xwe. PKK'ê li hemberî taritiya hemû dewletên kaptalîzim û zihniyata sermayedaran bû çiruska azadiyê.

### PKK'ê bi mejiyekî mezin rêbaza jiyana azad afirand

Partiya Karkerê Kurdistan PKK'ê ku bi pêşdîtina kûr û hewldanên mezin ên Rêber Apo bi pêş ket û mezin bû, di têkoşîna xwe ya 47 salan de mîna ku bi derziyê bîrê bikole hebûn ji tinebûnê, vejîn ji çikandinê, rizgarî ji qirkirinê, serxwebûn ji mêtingeriyê û gelekî leheng ê ber bi azadiyê ve dimeşe, afirand. Têkoşîna PKK'ê ku her kêliyeke xwe weke destanekê derbas bû, herwiha heqîqeta jin a azad û milîtaniya PKK'ê ya bi ruhê fedaî yê Apoyî şer dike afirand û ji gelên bindest û tevahiya mirovahiyê re kir diyar e. PKK'ê mejiyekî mezin, çand, ziman, bawerî, manewiyat û rêbaza jiyanê ya azad afirand û li Kurdistanê şoreşa herî civakî ya bingehîn pêk anî.

### Bi berxwedaniya PKK'ê re şoreşa azadiya jinê hat destpêkirin

Heqîqetên ku di şexsê PKK'ê de derketin holê; li Kurdistanê, Rojhilata Navîn û cîhanê rastiya mafdarî û neheqî, başî û nebaşî, azadî û koletî, demokrasî û netewedewletî, bedewî û qirêjî, rastî û şaşitî, fedaîtî û teslîmkarî, sekna azad û xiyanet, serbilindî û ketî, sosyalîzm û kapîtalîzm raxist pêş çavan. Herwiha di nava têkoşîna lehengî ya PKK'ê de, pêşengiya partiyê û berxwedana gerîla hatin afirandin, şoreşa vejînê ya neteweyî hat bicihanîn, şoreşa azadiyê ya jinê hat destpêkirin, li dijî faşîzmê û komploya navneteweyî pêşengî ji têkoşînê re hat kirin, netewebûna demokratîk a Kurdistanê hat afirandin û PKK´ê li ser bingehê jiyana azad gelê Kurd ji nû ve zindî kir û tevlî nava neteweyên azadîxwaz kir.

### PKK'ê bi têkoşîna xwe ya ji 47 salan êrîş hemû têk bir

Bi têkoşîna PKK'ê ya 47 salan jî dewleta Tirk a dagirker her tim bi çekên giran û kîmyayî êrişî herêma parastina medayayê dikir û digotin em ê PKK'ê tune kirî, lê ev nêzîkatî û êrişên dewleta Tirk ne çû serî. Ji ber ku her dem PKK'ê ji bo paratina axa Kurdistanê têkoşîn û berxwedaniya bê hempa dide meşandin. Di heman demê de, damezrandina PKK'ê destpêka têkoşîna azadiyê bû. Rêber Apo di bin tecrîdê de jî ji bo azadiya gelan têdikoşe. Îro PKK'ê bi projeya neteweya demokratîk bûye hêvî ji gelên Rojhilata Navîn re. Dewlet jinê tine dihesibînin, lê belê bi PKK'ê re hêz û têkoşîna jinê bi çavên xwe dibînin. PKK'ê bi têkoşîna xwe ya ji 47 salan êrîş hemû têk bir. Li gel derfetên kêm jî em teknolojiya pêşketî ya dewleta Tirk têk dibin. Heta ku PKK'ê hebe wê dewleta Tirk ti carî negihêje armanca xwe.

### PKK'ê bi têkoşîna 47 salan gelek destkefî bi dest xistin

Partiya Karê Kurdistanê PKK'ê bi têkoşîna 47 salan gelek destkeftî bi dest xistin, herwiha di 27'ê Sibatê de Rêber Apo piştî berxwedaniya 27 salan banga Aşîtî û Civaka Demokratîk kir. Di heman demê de vê bangê li Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê deng ve da, lewma li ser banga Rêber Apo a bi dawî kirina şerê çekdarî komek ji PKK'ê xwe fesxkirin û bi merasîmeke sembolîk çekên xwe şewitandin, ev yek jî weke nameyekê bû ji bo tevahî cîhanê û hêzên dijber ku em şerê çekdarî radiwesînin û ji bo doza gelê Kurd û Kurdistanê derbasî qonaxa siyasî û qanûnî dibin. Ji vê yekê zêdetir niha PKK'ê şerê çekdarî rawestandin û li ser daxwaza Rêber Apo derbarsî qonaxa siyasî û qanûnî bûye, lê dewleta Tirk heta niha tu gavên piratîk ji bo pêvejoya aşîtî û civaka demokratîk ne avêtin e. Ev yek diyar dike ku dewleta Tirk naxwaze ku aşîtî û civaka demokratîk pêk were. Ji ber vê yekê pêwîst e bi awayekî lezgîn gef li dewleta Tirk werin kirin da ku bi awayekî lezgîn aşîtî û civaka demokratîk pêk were.

### 'Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk teqez ew ê bigihîje serkeftinê'

Li ser bingehê banga Aştî û Civaka Demokratîk gavên mezin hatin avêtin, herwiha piştî wê careke din di 26'ê Cotmeha 2025'an de ji aliyê PKK'ê ve gaveke dîrokî hate avêtin. Di gavê de PKK'ê bi merasîmekê biryara vekşîna hêzên xwe ji Bakur û Tirkiyê da, lewma PKK diyar kir ku wê manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk teqez ew ê bigihîje serkeftinê.



## Bakur-Rojhilatê Sûriyê li ser mîrasa PKK'ê zindî ye!

**Dilyar Cizîrî**

Em di van rojan de pêşwaziya salvegera 47'an a damezirandina Partiya Karkerê Kurdistanê dikin. Rasthatina vê salvegerê ji yên beriya xwe cûdatir e, bi taybet bi gava dîrokî ya Banga Aştî û Civaka Demokratîk a Rêber Abdullah Ocalan ku di 27'ê sibetê de dest pê kir. Ji wê demê ve Tevgera Azadiyê di çarçoveya xwedîderketina li bangê gavên li pey hev avêtin.

Ji wan gavan encama Kongreya 12'an a PKK'ê û biryara fesixkirinê ye. Min şîroveyên hin derdoran xwend wiha fam kirine ku her tişt bi dawî bûye. Dibêjin piştî 47 salan her tişt diqede, ya rast tam berûvajî wê ye. Ji xwe Rêber Abdullah Ocalan di peyamên xwe de sedem û bandora biryara fesixkirina PKK'ê vekiriye.

Ya balkêş jî li aliyê din girseya gel li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji çend rojan ve bi coş û kelecaneke mezin pêşwaziya salvegera damezirandina PKK'ê dikin. Ev jî bawerî û asta girêdana civakî ya bi tevgerê ve nîşan dide. Rast e PKK'ê biryar da û xwe fesex kir. Lê mîrasa tekoşîna dehên salan zindî ye û têra pêşvebirina pêvajoyê dike. Bi taybet ez ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibêjim.

Şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser mîrasa PKK'ê ya em behsê dikin ava bû. Zemîna wê ya sereke jî tekoşîna Rêber Abdullah Ocalan a 20 salan a di vê qadê de ye.

Ji bo em baştir rave bikin, pêwîst e em pêvajoya beriya serhildana gel a Sûriyê bi bîr bixin. Rêjîma Baas piştî serhildana 12'ê Adarê ya sala 2004'an bi ser gelê Kurd hat û zordariyek mezin da meşand. Tevgera siyasî ya Kurdî li Sûriyê bi hemû partiyên xwe ve ji şoreşê re ne amade bûn.

Ên di rojên destpêkê de ala şoreşê rakirin şagirtên Rêber Abdullah Ocalan û xebatkarên dema tevgera PKK'ê li Rojava û Sûriyê di asta xwe ya herî bilind de bûn. Bi ezmûna 20'an a hebûna Rêber Abdullah Ocalan a li vê qadê û tekoşîna demdirêj a PKK'ê serkeftina şoreşê pêk hat. Şagirtên Rêber Apo yên ji kaniya tevgerê av vexwarin mîna Şehîd Xebat Dêrik, Sadiq Kobanê, Nûredîn Sofî û her wekî din bar rakirin. Encamên îro tême jiyankirin û hebûna sîstemek demokratîk wekî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, herwiha hebûna hêzeke stûnên biratiya gelan diparêzin wekî QSD'ê berhema wê tekoşînê ye.

Heger îro li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevî dijwariya plan û êrişên têne meşandin, komkujiyên wekî yên Perava Sûriyê, Siwêda û wekî niha li Humsê pêk nayên, ew bi saya mîrasa tekoşîna PKK'ê û Rêber Apo ye. Ji lewra divê di destpêka nû ya Banga Aştî û Civaka Demokratîk a ji berhemê rihê PKK'ê hatiye, em hîn zêdetir xwedî li nirxên zindî yên bi tevgera PKK'ê hatin afirandin, derkevin.

Ev bi taybet di vê dema veguhêz a Sûriyê tê re derbas dibe pêwîstiyeke demê ye. Tenê bi parastina van nirxan û xwedîderketina li Banga Aştî û Civaka Demokratîk em ê karibin hemû planên dijber têk bibin, fermiyeta xwe di asta navdeweltî de mayînde bikin û parastina xwe ya heyî hîn misogertir bikin.




# Şehîd Dozdar Hemo ji ciwanên azadîxwaz re bû nimûneya azadiyê

Têkoşerê Kurd Dozdar Hemo di nava 30 salî de ji bo azadiya Kurd û Kurdistanê têkoşîneke bê hempa da meşandin, ew hem fermandarekî zîrek û pêşeng bû, hem jî hostayekî zîrek ê ramanê bû.

**Navenda Nûçeyan**

### Kurtejiyana Şehîd Hemo

Şehîd Dozdar Hemo di sala 1969'an de ji bajarê Efrînê ji dayîk bû ye. Efrîn weke ku tê zanîn, navendeke çandê ye ku nirxên azadiyê yên Kurd, nirxên şoreşa çandiniyê, nirxên baweriya aryenîk lê têne parastin û mezinkirin. Efrîn bi serê xwe Kurdistan e. Çanda civaka exlaqî û polîtîk ku bi parastina wê, jiyandina wê û bi PKK'ê re bi yekbûnê, bi nirxên berxwedanê mayinde kirî, Kurdên azad ên ku di civakîbûna Efrînê de derketî holê, aniye asta ku bibe mirovên mînak ên serdemê. Şehîd Dozdar, bi van nirxên civakî mezin bû ye, ji kûr ve bi ser axa xwe ve girêdayî, nirxên civakî di ser her tiştî re girtiye, yekbûna bi hemû parçeyên Kurdistanê bi asta herî jor jiyan kirî, bi helwesta xwe ya milîtaniya pêşeng, tevahiya jiyana xwe bûye fermandarê mînak. Hê bi ciwanî polîtîkayên qirkirinê yên li ser Kurdistanê dîtiye û ji bo azadiya Kurdistanê biryar li ser têkoşînê da û 1990'an tevlî



nav refên Tevgera Azadiyê bû. Piştî ku tevlî PKK'ê bû, ji Rêber Apo perwerdehiya jiyan, israr têkoşînê geş kir.

### Pêşengê Kurd Dozdar bi salên dirêj di şertên herî giran de şervanî kir

Şehîd Dozdar Hemo bi salên dirêj di şertên herî giran de şervanî kir, li gelek qadên welêt ma, hê bi ciwanî di kesayat û helwesta xwe de fermandarî pêk anî. Lewma bi salên dirêj li qada şer xebatên leşkerî dan meşandin û tevlî gelek çalakiyan bû, Şehîd Dozdar ji bo her ciwanekî re bû nimûneya azadiyê. Mohra xwe li serketinên mezin da, di serî de bi kesayat, piştre li hemû qadên jiyanê, bi bawerî tevlê bû. Bi vê kûrahiyê hişmendiya rêveberî û pêşengiyê gelek xebatan dan meşandin. Herwiha şehîd Dozdar Hemo yekemîn kes bû ku di ragihandina Tevgera Azadiya Kurdistanê de cih girtî ye.

### Şehîd Dozdar fermandarekî zîrek û pêşeng bû

Şehîd Dozdar hem fermandarekî zîrek û pêşeng bû, hem jî hostayekî zîrek ê ramanê bû. Bi nivîs, helbest, analîzên xwe yên siyasî, bi hêza mezin a propagandayê, mirov, jiyan û cîhan weke ku pirtûkek be dixwend û tiştên ku dixwend jî bi hostayî dikarîbû vebêje û binivîse. Bi salên dirêj di xebatên Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê de rêveberî kir, di serdemên krîtîk de bi rolên girîng rabû. Li gel vê, di xebatên civakê de, di xebatên propaganda, dîplomasiyê de cih girt, bû xwedî helwest ku dema partiyê hewce dît li her deverê ji her peywirê re hazir bû.

### Şehîd Dozdar kesayateke civakî bû

Şehîd Dozdar, kesayateke civakî bû ku bi devlikeniya xwe, bi diyaloga ku bi her kesî re, bi têgihiştina civakiya pozîtîf hem bi hevrêyên xwe re û hem jî bi gel re karîbû têkiliyê deyne parve bike. Di heman demê de, Şehîd Dozdar îlhameke mezin ji şoreşa Rojava wergirt, pê bi coş bû û bi keda xwe tevkarî lê kir. Hişmendiya komînal a kûr a civakîbûna Efrînê di jiyana wî de diyarker bû. Gelekî dilsozê xak, çand û civakîbûna Efrînê bû. Bersiva li bîranîna Şehîd Dozdar ew e ku tola Efrînê bê hilanîn, Efrîn bê azadkirin û ji nû ve veguhere qada herî bedew a jiyana azad.

## Li Sûriyê û vebijarka demokratîk



**Zekî Bedran**

Li Sûriyê, dewleta Tirkiyê bi israr li pey damezirandina avahiyek netewe-dewletê ya navendî ye. Wekî ku tê zanîn, rejîma Baasê jî avahiyek dewletê ya yekdestî ava kir. Pergala yekpartî rê neda hebûna kesên cudaxwaz û pirrengiyê. HTŞ'ê desthiladariyekê afirand ku di bingeh de faşîst bû, gel dixeniqand. Bi van rastiyan re, sedema xwesteka Tirkiyê ji bo avakirina dewletekê tûndirew û navendî ya hişk çi ye? Bê guman, armanc ew e ku rê li ber bidestxistina statuyê li gelê Kurd bigire! Armanc ew e ku wan neçar bike ku bikevin jêrzemîneke tarîtir ji rejîma Baasê ji bona ku civaka Sûriyê, da ku ew rengên xwe yên rastîn û demokratik nebînin. HTŞ komekî ku hişmendiyekê olî û dij-demokratîk e. Xwedî hişmendiyekê yekdest e ku cudahîyan wekî gef dibîne û derfeta jiyanê ji wan re nahêle. Ew ji derdorekê siyasî ya wekhev û piralî re girtî ye. Ew ne dilsoziyê, xulamiyê bingeh digir e. Ew derdorên ku dibêjin em cûdahîxwazin wana bi komkûjiyan re derbas dike, wekî ku bi Elewî û Durzî re pêk anî. HTŞ'ê bi bingeh girtina hîn derdorên xwediyê hişmendiya tund û bi dayîna fermana ku kuştina her kesê ku ne weke wan difikir e ferz e, siyaseta hilweşandina civakê pejirand.

HTŞ, bi bingeh û hişmendiya xwe, rêxistineke desthilatdar e. Rêya rêxistinên desthilatdar ên tundrew faşîzm e. Ew kesên ku li dijî wê ne red dike. Ew nikare rêxistin û pêşbaziya wekhev a hêzên siyasî yên cuda bingeh bigire, hênasa wê bo wê rêbazê teng e. Kiryarên Baasiyan eşkere ne. Baasiyan kesên ku weke wan nedifikir în, yên ku red dikirin beşdarî pergala partiyê bibin, ji civakê dûr dixistin. Ji bo ku mirov tevlî burokrasiyê bibe, pêşveçûnekê ava bike, an jî ji çavkaniyên dewletê sûd werbigire, dive tu endama/ê partiya Baas ba. Ew îstîxbarat û polîsan li ser kesên ku cuda difikirin û rexne dikin re weke gef diajo. Ew ji dewletê têne dûrxistin. Kesên weha ji her cûre xetereyan re bêparastin dibin. Zext û salan mayîna di girtîgehan de, bêyî lêpirsîn an parastinê, her ku diçe dibin rojan e. Yên di vê rewşê de ne, an radest dibin, ji bo xulamiya wan bikin, an jî jiyana xwe winda dikin. Yên bextewar, ku nikarin li Sûriyê bisekinin û bi xetereyek nêzîk re rû bi rû ne, direvin derveyî welêt. Mîrata rewşenbîrî ya welêt tê hilweşandin. Civak ji siyasetê tê dûrxistin. Ew ji rêbazên rêxistinkirin û lêgerîna mafên xwe bêpar dimînin. Gel re bi hilbijartina "Siyaset û rêveberiyê ji me re bihêle, hûn herin û bi debara xwe ya rojane re mijûl bibin" dimîne. Ev yek dihêle ku çandeke demokratîk li welêt dernekeve holê. Rejîma Baasê ji bo bidestxistina rewabûnê hilbijartin li dar xist. Lê ti carî hilbijartinên demokrat nehatin lidarxistin. Her tişt bi awayekî navendî hate plansazkirin û destnîşankirin. Di encamên hilbijartinê de qet cudahî çênebûn. Hafiz an jî Beşar Esed bi nêzîkî rêjeya %100 dengan dihatin hilbijartin.

Niha, HTŞ bêyî beşdarbûn an jî hevkariyê hikûmetek demkî ava kiriye. Wan bi xwe serokkomar hilbijart. Wan bi xwe destûra demkî amade kir. Wan rewşenbîr û beşên din ên civakê ji nîqaşên destûrî û pêvajoya nivîsandina destûrî derxistin. Qaşo parlementoyek ava kirin. Ehmed Şera dê rasterast sêyeka van endaman wesaz bike, û desteyekê dê yên mayî bi cîh bike. Ma ev dikare wekî hilbijartin were binavkirin? Ma ev dibe wekî demokrasî û nîşana vîna gel were binavkirin? Bê guman na. HTŞ îdîa dike ku artêşek ava dike. Ew kesên ku ew ji bo artêşê di hilbijartine, perwerdekê olî ya dijwar de derbas dibin. Ew hişmendiya xwe li serê mirovan de diçînin. Eşkere ye ku hişmendiyeke wisa de nikare ji artêşekê netewî derkeve. Wekî din, ew îdîa dikin ku bi dehan komên çekdar, ku ji DAIŞ û El Qaîdeyê ne, ku di hemî sûcên şer û sûcên li dijî mirovahiyê de beşdar in, tevlî artêşê kirine. Hêzek leşkerî tine ku parastina welêt û ewlehiya gel misoger bike; berevajî vê ye. Heman tişt ji bo ewlehiya navxweyî û hêza polîsan jî derbasdar e. Ew serbazên polîsan û karkeran sazûman dikin. HTŞ bi xwe waliyan wesaz dikin. Ew bi xwe melayên mizgeftan tayîn dikin. Ew qaşo saziyan binavê ku bermahiyên Baasê paqij dikin û karmendên xwe di hemî cihên rêvebirinê de bicîh dikin. Dezgehên medya û kanalên televîzyonê yên dewletê, ku ji rejîmê mane, dagir dikin û pergalekê propagandayê ya yekalî ava dikin. Wan çavkanî û jêderên aborî yên heyî yên dewletê bi xwe ve girê dane.

Siyaset û rêveberiyek navendî ya desthilatdar, wekî ku tê dîtin, hêdî hêdî hemu desthilatdarî û çavkaniyan navendî dike. Avahiyek dewletê ya navendî wekî sosretekê li ser civakê dadikeve. Ew di heman demê de şêwaza rêveberiyêkê ya pir qels û giran, diafirîne. Hemî çavkaniyên welêt di bin dilxwaziya kesên ku vê amûrê kontrol dikin de ne. Gendelî, dizî û neheqî dibin bêrawestan. Neheqiya mezin di belavkirina jêderan de neçar dibe. Li şûna ku edaletê bide, pergala dadwerî berjewendiyên bihêz û xwedî hêz diparêze, wê vediguherîne çeka li dijî kesên ku nerazîbûnê nîşan didin. Encama ku dewletek yekreng û navendî dikarin bêtir werin rêzkirin. Kiryarên rejîma Baas jî eşkere ne. Di vî warî de, avakirina pergala demokratîk, nenavendî û federal a li ser bingeha rêveberiyên xwecihî û herêmên yên xweser an jî yên xurtkirî vebijarka herî rastîn e. Li Sûriyê tewahî avahiyeke piralî û azadîxwaz a demokratîk pêwîst e.



## Qonaxa duyem; Civaka Demokratîk

**Farûk Sakik**

Deh sal bere Prof. Dr. Norman Peach di axaftinek xwe de digot: Li Tirkiyeyê û li tevahiya Rojhilata Navîn tenê yek rêbertiyek siyasî heye ku mirov dikare baweriya xwe bi gotina wî bîne û baweriyê dide hemû aliyan; ew jî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e.

Ev kesê ku behsa wî dike, di sala 1978'an de dema PKK ava kir, belkî bi tene bawerî dabû yên li dora wî kom bubûn û kesên ew naskirin bû. Bi demê re, bi salan re, di qada navneteweyî de bû kesayetek wisa ku êdî dewletan jî li gorî paradîgmaya wî sîstemên xwe ber çavan derbas dikirin.

Bi qasî navî wî, navê partiya wî PKK jî dihat nîqaşkirin. PKK'ê bawerî dabû gelên Kurdistanê. Her kesî bawerî anî ku pirsgirêkên henin, ji aliye vê tevgerê ve wê werin çareserkirin.

Şer, şehadet, êş, komkujî, qetlîam li vê axê pirr hatin jiyankirin. Wê deme bedel dixwest û bedel dihat dayîn. Lê gelek encam hatin girtin. Hebûna Kurdan, bi Kurdan û bi dijminê Kurdan dane îspatkirin.

Di destpêka sala 2025'an de êdî derbasî serdemeke nû dibûn. Du merhaleyên vê pêvajoyê hebû; yek 'aşitî', du pêvajoya 'civaka demokratîk' bû.

Di pêvajoya aştiyê de PKK'ê bi kongreya 12'emîn ji bo encam girtina pêvajoya çaresriyê, xwe feshkir. Şerê çekdarî jî bi dawî kir. Dewletê jî êrişên xwe yê eskerî da seknandin. Şerê dewletê yê navxweyî (şerê AKP û CHP) bû sedema ku pêvajoya nû dereng serbasî merheleya 'civaka demokratîk' bibe.

Dema lijneyek ji komisyona meclisê derbasî Îmralî bû û bi Rêber Apo re muzekere dane destpêkirin, ev pêvajo derbasî qonaxa duyem a 'civaka demokratik' bû.

Di vê pêvajoyê de êdî sedemên ku şer dabûn destpêkirin dive hêdî hêdî ji holê werin rakirin. Statu û nasnameya Kurd êdî di çarçoveyek de were bicîh kirin. Çareseriyên wisa werin kirin ku êdî tucarî vegera kodên bere ne mumkin be.

Salek berê dema ku ev serdema nû destpêkir, herdu aliya behsa qedera herdu gelan ya dîrokî dikirin. Şerê Milazgirt, Çaldiran, û şerê Îstiklalê hin mînakên hevkariya Kurdan û Tirkan a dîrokê bûn. Ev mînak dihatin dayin û digotin vî rihî em dîsa îroj ji nûde dikarin zindî bikin. Di gotin, kê demê ev herdu gel ji hev qût bûn, rastî êrişên hêzên ji derve hatin û biçûk bûn.

Herî dawî Kemal Kiliçdaroglu jî behsa geşedanên Rojhilata Navîn kir. Peyva xwişk û biratiya gelan kir. Navnîşana pêşîgirtina talûkê jî, Îmrali îşaret kir.

Di qonaxa civaka demokratî de kare herî mezin li ser milê dewletê û civakê ye. PKK di qonaxa yekem de misyona xwe pêk anî. Rêber Apo nexşeriya xwe şandî ji tevgera azadiyê û ji dewletê re. Herdu alî jî berî dest bi vî karî bikin dive şertên jiyana Rêber Apo de hin sererastkirin werin çêkirin da ku pêşî li xebatên yên pêşerojê de veke.

Dewlet bi derxistina qanûna û bi dermankirina bîr-hafizayê dest bi pêvajoya duyem bike. Aliyên Kurdan jî bi xebatên xwe yên siyaseta demokratik civakê ji vê serdema nû re amadebikin.

Di vî warî de gelek kêmasî çêbûn û pêvajo ji civakê hat veşartin. Rêber Apo di her hevdîtinên xwe de digot civakê bidin fahm kirin. Lê mixabin hin çalakiyên ji rêzê û bi hin civînên teng, nikaribûn encam bigirin. Di nav civakê de hên jî gelek pirsen bêbersiv hene. Dive kadro û pêşengê siyaseta demokratik, bersiv bidin pirsen gel.